

Ji bo dêûbavên, zarokên wan diçin kreşên Berlinê

16.06.2021

Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser vegera bo xebata asayî ya piştî 21ê Hezîrana 2021an

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

Di vê sala xebata hêlînê ya 2020/2021an de bi mehan zehmetiyên mezin ji me re derketin. Di dema pandemiya koronayê de û li gorî Rêzicknameyên Parastina ji Enfeksiyonê ya SARS-CoV-2 wisa bû, ku diviya tenduristiya zarok û xebatkaran were parastin, derfeta sûdgirtina ji perwerdehiya ji bo zarokên biçûk were pêkanîn û bihevne meşandina malbat û xebatê dîsa were saz kirin.

Ji ber rewşa enfeksiyonê ya hevseng û kêma li hêlînên zarokan ên li Berlinê, senatoya Berlinê di civîna xwe ya di 15.06.2021an de biyar stand, ku herî dereng piştî **21.06.2021an** tevahiya saziyên piştgiriya zarokan a ji bo danê rojê dîsa vegehin ser **xebata asayî** – li gorî liberçavgirtina pêdiviyên ji ber encamên pandemiya Covid-19.

Em bi vê yekê gelek kêfxweş in, ji ber ku em dizanin, di mehên dawî de kîjan astengî ji we dêûbavan re û zarokên we re derketine.

Rêbazên nû tên vê wateyê:

1. Tevahiya zarokan sûdê ji **lênêrîna li gorî çarçoweya kûpona xwe ya şexsî** digirin.
2. Pêdiviya lînêrîna zarokan a **di komên sabît de betal dibe.**
3. **Demên xebata asayî** dîsa pêk tên.
4. Divê **xizmetên lînêrîna zû û dereng** ên li saziyan dîsa li gorî çarçoweya demên xebata asayî **werin pêşkêşkirin.**
5. Demên girtina saziyan a di navbera havînê de dikarin wisa were pêkanîn, ango wekî hatiye plankirin û bi malbatan re hatiye axaftin. Di heman demî de rêbaza § 3 bend 4 RV Tag jî derbas dibe, ku li gorî vê yekê divê sazî bi riya axaftina li gel dêûbavan **di dema girtina saziyan de xizmeteke maqûl a lînêrîna zarokan pêk bînin.**
6. Lînêrîna zarokan a li **navendên hevxebatê** dîsa pêkan e.
7. Gava sazî bixwazin, pêkan e ku ew beriya **21.06.2021an** dîsa vegerin ser **xebata asayî.**

Em didin zanîn, ku – bi taybet ji ber rewşa pandemiye ya berdewam dike – her wisa piştî dîsa destpêkirina xebata asayî hêj jî astengiyên di çarçoweya lînêrîna zarokan de, bo nîmûne ji ber kêmbûna xebatkarên li hêlînê, dikarin pêk werin. Di rewşeke wisa de hêlîna we ya zarokan dê li gel we û çavdêriya hêlînên zarokan bişêwire.

Di dema xebata asayî ya di bin şertên pandemiye de divê dêûbav bi maske derbasî nav saziyê bibin. Divê mirov hay ji mesafeyê hebe. Li hêlînên zarokan dê ji bo anîn û birina zarokan beşa libendêmanê were sazîkirin. Divê gelemperî tenê dê yan jî bav bi zarokan re were hêlînê.

Dêûbavên hêja,

haya me ji wan zehmetiyan heye, ku di vê sala xebatê ya hêlîna zarokan de pêk hatin û em hêvî dikin, ku bi riya paşveçûna bûyera pandemiye û destpêkirina xebata asayî êdî hêj bêhtir hevsengî û derfeta plankirinê di jiyana rojane ya hêlînan de pêkan be.

Ji bo pirsên we, xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan hete 24.06.2021an di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an hete 15an xwe bigihîninê.

Piştî betlaneya havînê xeta telefona acîl dê piştî 09.08.2021an dîsa hete 31.08.2021an di xizmeta we de be.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk